

---

# Neteweperweriya Kurdî û Hin Argumanên li Dijî Wê

---

Fexriya Adsay

---

Kêmtirîn du sed sal e ku têgeha neteweperweriyê li Ewropayê peyda bûye û gav bi gav li hemû cihanê ketiye nav qada siyasetê. Her çiqas bê gotin ku gelek pênaseyên neteweperweriyê hene û çarçoveya wê têra xwe ne diyar e jî, di vê nivîsê de tiştê ji neteweperweriyê tê famkirin hemû ew kirinên neteweyekê ne di riya bidestxistin an domandina serweriya siyasî ya li ser axa xwe ye. Serweriya siyasî ya tê armanckirin dibe ku serweriya dewleteke serbixwe be ku xwedî otorîte be di karûbarên navxweyî û navneteweyî de lê dibe ku serweriyeke jî vê kêmtir be jî, mîna otorîteyêke federatîv.

Berî behsa neteweperweriya kurdî, baş dibe ku bal bê kişandin ser peyvên *dewlet* û *neteweyê*. Di warê pênaseya van têgehên de ji nivîsa Walker Connor<sup>1</sup> hatiye istifadekirin. Bi qewlê Connor, peyvên *netewe* û *dewletê* gelek caran li şûna hev tînin emilandin û ihtimal e, peyva *netewe-dewletê* jî ber vê bikaranîna li şûna hev peyda bûye. Dema ev herdu têgeh bi riheî li şûna hev tînin bikaranîn, wê ne ecêb be ku neteweperwerî jî divê were maneya xwe-yekkirina (identification) bi dewletê û sêdaqata bo dewletê, ne sêdaqata bo neteweyê bi xwe.

Dewletên cuda yê serbixwe bi hev re sistema siyasî ya cihanê pêk tinin. Hejmara dewletên serbixwe diyar in û loma dewlet bi hêsani dikare bê pênasekirin bi termên çendahi. Sinorên pênaseya dewletê zelal û stûr in. Ligel ciyê wê yê di nexşeya siyasî de, mezinbûna ax û gelheya wê, paytextê wê,

---

<sup>1</sup> Walker Connor, "A nation is a nation, is a state, is an ethnic group is a ...", *Ethnic and Racial Studies*, hej. 1:4, sal 1978, rr. 377-400.

hwd. bide pênaseya dewletê derdikeve holê. Lê pênasekirin û bêtêginkirina *neteweyê* zehmettir e ji ber ku bi qasî dewletê ne şênber e. Li gor ferhengêke Têkiliyên Navneteweyî<sup>2</sup>, netewe komeke civakî ye ku xwedî îdeolojiyêke hevpar, sazî û adetên hevpar û hesteke homojenbûnê ye. Ferheng wiha dewam dike, “zehmet e meriv neteweyê ewqas qethî pênase bike ku bikaribe wê cihê bike ji komên din ên mîna mezhebên dinî, ku xwedî heman taybetmendî ne. Halbûkî di “netewe”yê de hesteke xurt a aîdbûna bo axekê (wela-tek) diyar heye ku wê tenê aidî xwe dibîne.” Li gor vê pênaseyê, ew pîrsgirêka di pênaseya netewe-dewletê de zelal dibe. Îro pîr kêma netewe-dewlet hene ku tenê ji yek neteweyê pêk tînin. Di piraniya dewletan de ku wek netewe-dewlet tînin pejirandin, ji yekê zêdetir netewe hene; yek netewe hegemon û diyarker e di şikilgirtina desthilatdariya siyasî de, lê, li bende ne a/yên din entegreyî wê neteweya serdest bibin. Neteweyên din ew axa ku ew xwe aid dibînin cuda ye ji ya netewe-dewletê. Sedaqata wan ji dewletê bêtir, bo neteweya xwe ye; bêsedaqatbûna wan her tim dibe sedema kêşeyan. Li Tîrkiye, Îran û Sûriyeyê kurd, li Kanadayê quebecî, li Îspanyayê katalan, baskî û galîzyayî, li Afganistanê peştûn, hwd. mînak in ji bo ev cure netewe-dewletan. Li gor van pênaseyan, eşkere ye ku Yekitiya Neteweyan binavkirineke xelet e; divê *Yekitiya Dewletan* bûya. Disiplîna Têkiliyên Navneteweyî divê *Têkiliyên Navdewletî*, Dadgeha Edaletê ya Navneteweyî *Dadgeha Edaletê Navdewletî* bûya.

Ger em bi têgehên Connor ên nivîsa wî “Nation-Building or Nation-Destroying?”<sup>3</sup> (Netewe-sazî an Netewe-hilweşandin?) bibêjin, pêvajoya “netewe”-sazîya dewletên mîna Tîrkiye, Îran, Sûriye û Iraqê di eslê xwe de pêvajoya sazîkirina wan dewletan bi xwe ye. Di nav sînorên her çar dewletan de ji yekê zêdetir netewe hebûn û yek ji wan neteweya kurd bû. Li Tîrkiyeyê neteweya tirk, li Îranê neteweya faris, li Iraqê û Sûriyeyê neteweya ereb serdest bû. Her çar dewletan jî siyaseta wan hebûna xwe li ser tunekirina neteweyên din ava kirin. Loma, di navbera pêvajoya avabûn û xurtbûna wan dewletan û astengkirin û hilweşandina neteweya kurd de korelasyonê heye; dewlet-sazîya wan çar dewletan dikare wek hilweşandina neteweya kurd (û yên din) bê xwendin.

Li Tîrkiyeyê —ji bo Îran, Iraqê û Sûriyeyê jî— ji damezrandina Komara Tîrkiyeyê vir ve, pîrsgirêk ew e ku dewletê sedaqata kurdan bo xwe bi dest nexistîye. Kurd, ligel axeke wan, çand, dîrok û zîmanekî wan hevpar heye ji yên neteweya tirk cuda. Lê îdeolojiya damezrandina Dewleta Tîrkiyeyê, vîzyona wê ya siyasî, avabûna desthilatdariya wê ya siyasî neteweya tirk temsîl dike. Saziyên wê li ser zîman, çand, dîrok û hestên hevpar ên neteweya tirk ava

<sup>2</sup> Jack C. Piano û Roy Olton, *The International Relations Dictionary* (New York: Holt, Rinehart and Winston, Inc., 1969), r. 119.

<sup>3</sup> Walker Connor, *Etnonationalism The Quest for Understanding*, Princeton University Press, 1994, rr. 28-67.

bûne. Ji kurdan hatiye/tê xwestin, hesta aidbûna bo axa Kurdistanê, çand, ziman, dirok û nirxên xwe biguherînin bi hesta aidbûna bo dewleta Tirkîyeyê û ziman, çand, dirok û nirxên neteweya tirk. Têmsilîyeta neteweya tirk û nebûna-têmsilîyeta neteweya kurd li qada nav-dewletî û di rêxistinên navdewletî de ji didome. Wek mînak, neteweya kurd nikare li Neteweyên Yekbûyî doza mafên xwe yê kolektîv bike an doza desthilatdariya siyasî ya li ser axa xwe bike. Endamên neteweya kurd nikarin wek “kurd” beşdarî çalakiyêke sportîv, çandî an zanistî ya navneteweyî bibin. Sîstema siyasî ya cihanê neteweyên hegemon û xwedî-desthilatdariya siyasî nas dike; wan mixatab digre; mafên wan diparêze; daxilî nav hiqûqa xwe dike. Kurd di qada navneteweyî de ji ne kurd in, tirk in ji ber ku li ser pasaporta wan de “tirk” dinivîsîne. Dewleta Tirkîyeyê, desthilatdariya wê ya siyasî li hundir û li qada navdewletî çiqas xurt dibe, ew tê maneya xurtbûna hegemonyaya siyasî, aborî û çandî ya neteweya tirk a li ser neteweya kurd. Ev bû ferqa navbera makezagona 1921ê ku hebûna neteweya kurdan dipejirand û statuya otonomiyê dida, û ya 1924an ku ji bilî neteweya tirk û mafên wan ên kolektîv, neteweyên din tune dihesiband. Di dema ya yekem de, tehdida êrişên derve hebû, dewleta —neteweya— Tirk hê desthilatdariya xwe ya siyasî ava nekiribû, loma pêwîstî bi aligiriya kurdan hebû. Di 1924an de, Komara Tirkîyeyê hatibû damezrandin; di qada siyasî ya navdewletî de hatibû naskirin û êdî dikaribû hêza xwe li hundir bi kar bîne. Ji wê vir ve her îtirazeke neteweya kurd bi şidetêke mezin hatiye/tê redkirin.

Neteweperweriya kurdî ev fikir û îdeolojî ye ku vê statukoya di aleyhê kurdan de biguherîne. Armanca nihayî avakirina desthilatdariya siyasî ya neteweya kurd e li ser axa xwe. Ji bo kurdan neteweperwerî temama wan hemû rê û rêbazan e ber bi bidestxistina azadiya diyarkirina siberoja xwe diçin. Yek ji van rêbazan ew e ku sînoren “me” “wan” diyar bike; hestên aidbûna “me” û axa “me” xurt bike, û ji bo vê amûrên çandî û aborî, gotarên siyasî, diroki û çandî biafirîne.

Netewe, wek têgeh û kolektîvîteyêke civakî çiqas nû û modern be jî, gelek caran xwe spartiyê serdemên qedîm, hestên primordiayal û bîra diroki. Lê di sedsala bîst û yekemîn de ev tîr nakin ku endamên neteweyê bîn serferberkirin da ku statukoya heyî bê hilweşandin. Divê neyê jibîrkin ku ew neteweya muxayel a di hişê neteweperweran de, di nav kêmtirin sed salî de hatiye xwestin ji hişên endamên neteweyê de qet çênebe an jê bê derxistin, bêqîmetkirin, piçûkkirin, bêiradekirin bi riya gotar, pratîk û sazîyên kolonyalist ên neteweya hegemon a kolonyalist. Siyaseta neteweya hegemon a kolonyalist a ji bo bidesxistina sêdaqeta kurdan bê encam nemaye; texribatên derûnî, civakî, çandî û aborî hiştiye li dû xwe. Tesbîtkirin û pênasêkirina van texribatan dikare roleke grîng bilize di diyarkirina nexşeya riya rizgariyê de. Di hewldanên bidestxistina sêdaqeta endamên neteweyê de emilandina rebazên modern ku berê wan ber bi siberojê ve ne, wê roleke grîng bilize. Wek

mînak, aqlêkî rasyonel di jinûvebirêxistinkirina civakê de, peymaneke civakî û hiqûqeke navxweyî ku endamên wê bikaribin di nav şert û derfetên wekhev de reqabet bikin; her endamek xwe-sazkirina neteweyî û serweriya neteweyî bi kêrî berjewendî û heysiyeta xwe bibîne. Neteweperweriya kurdî herî kêm bi qasî neteweyên din wek mafê xwe dibîne ku ji bo hebûna xwe bidomîne, çand, dîrok, ziman û adetên xwe biparêze, bibe endameke wekhev di sistema siyasî ya cihanî de, li hemberî serdestên xwe bisekine; serwer be û siberoja jiyana li ser axa xwe diyar bike.

Neteweperweriya kurdî, wek neteperweriya neteweyeke ku hatiye xwestin “xwe”tiya wê jê bê dizîn/tê dizîn, tevgereke li-xwe-vegerê û li-xwe-haybûnê ye ji. Tevgereke sazkirina xwebûniyê ye. Gringtirin hêmana xwebûniya neteweya kurd zimanê wê ye. Ligel axa Kurdistanê, zimanê kurdî ye ku tenê aidi wan e; wan ji neteweyên din cuda dike. Lê di bin siyasetên asimilasyon û tunekirinê de ziman xisareke mezin ditiye. Ji aliyekî ve, zehmet e em bê ziman “xwe”tiya xwe ya kolektîv saz bikin, li aliyê din jî, bêtî ku em bikarin li ser axa xwe desthilatdar bin, em ê nikaribin hebûna zimanê xwe bidomînin û zindî bikin di her qada jiyana de. Herdu pir ji nêzik ve girêdayî hev in û pêşmercên hevdu ne. Bi gotineke din, bê ziman em ê nikaribin li ser axa xwe “xwe” saz bikin û bibin xwediyê wê, bêtî axa xwe jî em ê nikaribin zimanê xwe bikin zimanekî ku bikaribe têkeve nav reqabeta bi zimanê din re; pir pir bibe amûreke folklorîk û nostalgîk.

Neteweya kurd û axa Kurdistanê niha di nav sinorên çar dewletan de parçebûyî ye. Loma neteweperweriya kurdî çiqas cihêkar be, ewqas jî bi ber hev tîne, li hev dicivîne. Kurdan jî tirk, ereb û farisan cihê dike, lê wan nêzîkî hev dike, li hev dicivîne. Sinoran datîne li navbera “xwe” û êdinên xwe de, sinorên li nav “xwe” jî radike. Lê, ger em ji bo bakur bipeyivin, neteweperweriya kurdî hê di vê astê de nayê nîqaşkirin an nakeve rojevê; ji asteke gelekî nizmtir tê nîqaşkirin.

\*\*\*

Li Bakur, serweriya tê hedefkirin her bi çi awayî be, grîng e ku pêşî kirdebûna kolektîf a netewe, kom an etnisîteya mewzûbehîs bê nasîn û pejirandin jî aliyê neteweya hegemon û hêzên din ên têkildar. Di vir de tecrubeya me kurdan diguhere ji piraniya tecrubeyên neteweyên din. Loma parçeyek grîng jî têkoşina siyasî ya kurdan<sup>4</sup> bûye ew ku xwe wek kirdeyeke kolektîf bide qebûlkirin ligel çand û zimanê xwe yî kolektîf. Belkî dikare bê gotin ku hewldanên ji bo xwe bidin qebûlkirin û bidin nasandin ketiye pêşiya/dewsa armanca bidestxistina serweriya siyasî û xwe-avakirinê bi xwe. Loma jî nîqaşên derheqê neteweperweriyê û asta wan jî ji yên neteweyên din cuda ye.

<sup>4</sup> Heta bereksê wê nê diyarkirin, qesta min kurdên bakurê Kurdistanê ye, ne tevahiya kurdan e.

Heta ew texribata li jor hat qalkirin, kiriye ku gelek caran fikir û argumanên dij-neteweperwer ji yê neteweperwer bêtir têkevin rewacê. Neteweperweriya kurdî, niha ligel hişmendiya ku bi riya sîstem û saziyên dewleta Tirkiyeyê li wan hatiye/tê empozekirin, lazîm e bi hişmendiya ku bi riya sazî û rêxistinên kurd bi xwe tîn afirandin jî şerê fikrî yê navxweyî bike.

Fikrên dij-neteweperwer ên di bîst salên dawî de bi riya nivîsên Evdila Ocalan<sup>5</sup> belav bûne, bi riya amraz û saziyên rêxistina PKKê û siyaseta wê ya legal tîn praktîzekirin, têra xwe nehatine xwendin û li ser nehatine nîqaşkirin ji aliyê him aligirên wê him mixalifên wê. Piranî dema kesek an çend kes fikrêkê davêjin holê, li gor statû û giraniya xwediyê xwe, ew fikir ji xwe re aligir û sempatizanan dibîne an nabîne. Lê nayê zanîn ka ew ên fikra nû pejirandine çima pejirandine; ên nepejirandine jî çima nepejirandine. Halbûkî, nîqaş û polemîk dikare riya fikrên nû an ên xurttir veke. Ji xwe fikrên nû û xurt ji nav valahiyekê dernakevin, gelek caran ji redkirina fikrên heyî derdikevin an bi nîqaş û polemîkên bi yê heyî re xurttir dibin, şiklê dawî digrin.

Çendî argumanên dij-neteweperwer ku bêtir bi riya nivîsên serokê PKKê belav bûne û ketine rewacê wê bîn nîqaşkirin. Yek ji çavkaniyên van argumanan pirtûka bi sernavê *Bir Uygurhk Hastahğı Milliyeçilik*<sup>6</sup> [Nexweşiyekê Şaristaniyê Neteweperwerî] e û argumanên wê bê nîqaşkirin ji vir hatine girtin. Yek ji van ew e neteweperwerî rê vedike li ber komkujiyên mezin.

### **Têkiliya neteweperweriyê bi komkujiyan re**

Herî kê m pnc hezar salên dawî yê mirovayeti kê m zêde tē zanîn. Lê gotina ku serokê PKKê idia dike, “Di dîroka dinyayê de ti carî ji van komkujiyên di bin navê neteweperweriyê de hatine kirin, zêdetir nehatiye dîtin... qirêjtirîn tēgeh e; herî zêde wê xisar daye mirovayetiye...” (r. 9), yekser bêdîrokiyê tîne bira meriv. Tê zanîn ku dîroka mirovayetiye bi xwe dikare wek dîroka desthilatdariyê û şerê ji bo bidestxistina desthilatdariyê, û kuştin û komkujiyan bê xwendin. Dîroka neteweperweriyê du sed sal e. Ew ê bêbîrî û bêdîrokîbûn be ku di mijara komkujiyan de du sed salên dawî yê dîroka mirovayetiye tenê bibe mewzûbehîs. An na, ger meriv ji riwangeyê dîroki ne bêpar be, wê bizanibe împaratorî û qraliyetan sînoren xwe çawa fireh kirine; ew gelên dikirin bin tehekuma xwe çawa, bi çi, bi kîjan amûrên şidetê

<sup>5</sup> Evdila Ocalan 23 sal in li Tirkiyeyê girtigehê de di bin kontrola dewletê de ye. Nivîsên ku tîn/bên behskirin li girtigehê hatine nivîsandin.

<sup>6</sup> Di pêşgotina pirtûkê de tē gotin, “heval Sinan Yoldaş analiz û perspektîvên Serok [Önderlik] wek talimat qebûl kiriye û dest bi vê xebatê kiriye. Berî ku xilas bibe di 16ê Çileyê 2008an de Sinan Yoldaş şehîd bû. Me, hevalên wî wek deynê xwe dit em biqedînin vê xebata Yoldaşê ku ji destpêka Akademiya Zanistên Civakî vir ve her tim bi awayekî çalak tē de ci girtiye... em vê xebatê di şexsê Sinan Yoldaş de diyari wan kesan dikin ku şehîd ketine di şerê dijî neteweperweriyê û dîvikên wê de.” Evdila Ocalan bi îmzeyê “Önder Apo” pêşgotinek nivîsandiye. Ci û dîroka weşanê ne diyar e. Wergera jêgirtinên ji pirtûkê aidî min in.

îdare kirine. Ne tenê împatoriya an qraliyetên mezin, dewlet-bajarên yunan di nav xwe de ji bi Împatoriya Pers ji şer dikirin. Li ser navê dîn û mezheban bi xwe şerên mezin û domdirêj çêbûne. Dîna îslamê bi şer û kuştinê ji nav qebileyê çola Erebiyan derket gihişt heta Atlantîkê. Axa Kurdistanê û kurd bi sedansalan di şerê navbera osmanî û êraniyan de pelçiqîn. Dema xwecihên parzemîna Amerîkayê, Awistralyayê qir dibûn, neteweperwerî tunebû. Dema artêşên qerase yê Xaçparêzan diçûn Rojhilat, ev ne li ser navê neteweperweriyê bû. An dema ewropîyan di nav xwe de bi dehan salan şerê mezheban dikirin, komkujiyên mezin pêk dianîn, ne neteweperwer bûn.

Di dîrokê de salên bê şer û kuştin derbas bûye gelek kêman. Ji ber ku mefhûma desthilatdariyê bi xwe ne tiştekî nû ye, li kuderê du û jê zêdetir kes hebûye, li wir desthilatdariya hebûye. Desthilatdariya li navbera kêman kesan an civatên piçûk, kuştin pêk nayê her tim. Desthilatdariya gelek caran bi mekanîzmayên cuda, bê şideta qebe dikeve meriyetê. Her ku civat û civak mezin bûne û pir bûne, di nav xwe an navbera xwe de li gor hêza xwe her tim di nav şerê fizîkî de bûne. Lê di şerên sedsalên 20 û 21. de ku wek sedema mezin-tirîn tehrîbat/wêrani/komkujîyan tê nîşandan, ferqek mezin heye helbet. Ew ferq, emilandina teknolojiyê ye. Di şerên 1000, 500 an 300 sal berê amûrên pê şer dihat kirin û ên van du sedsalên dawî em binin bira xwe, û bi bombeya atomê, balafirên şer, balafirên bê mirov, çekên kîmyewî hwd. bidin ber hev, em ê bibînin mesele ne ew e ku neteweyên dewlet ji împatoriyan bêrehmtir in. Amûrên modern ên ketin destê desthilatdaran kujertir in, û rêbazên modern û rasyonel ên birêxistîkirina civakê, mixabin, tenê jiyan hêsantir nekirin, projeyên mezin ên komkujîyê ji pêkan kirin, mîna qirkirina cihûyan dema II. Şerê Cihanê de. Ji ber ku ev bûyer di demeke nêzîktir de pêk hatine derheqê wan de agahiyên me zêde ne û hê şahidên wan ên li jiyandê ji hene, ji her aliyê ve berbiçav in lê, wek minak, em nizanin di Seferên Xaçparêzan de ku nêzîkî du sed salan dom kiriye, bi temamî çend kes hatine kuştin; di Şerê Sedsalî (Hundred Years' War) yê navbera Fransa û Îngilîstanê (1337-1453) de ji em nizanin çend kes hatine kuştin, komkujiyên çiqas mezin pêk hatine. Em ê ti carî nizanibin bê çend kes hatine kuştin, çiqas tehrîbat çêbûye dema artêşên du împatoriyan mezin ên osmanî û êranî li ser axa Kurdistanê bi hev re şer dikirin.

A din, hestên neteweyî cureyek ji hestên aidîyetê ye. Belkî îro mirov bi hestên aidîyetên neteweyî şer dikin, lê dîrok nîşanî me dide ku her cure hestên aidîyetên kolektîv bûne sedema şer; li gor dem û mekanê ev carna eşîrî bûn, carna qebileyî bûn, carna çînî bûn, carna dînî bûn hwd. Îjar dema derbarê têgehekê de bêyî riwangeyêke dîroki arguman tê sazîkirin, naveroka wan pûç û bêbingeh dimîne.

### **Têkiliya desthilatdarî û dewletê bi neteweperweriyê re**

Li gor serokê PKK û alîgirên wî, “kesên neteweperweriyê bêqîmet dibînin ji nikaribûn fam bikin bê kana xirabîya neteweperweriyê çi ye. Halbûki esasê neteweperweriyê desthilatdarî û dewlet e. Neteweperwerî xurttirîn ideolojiya zihniyeta desthilatdarî û dewletê ye.” (r. 11).

Ji bo meriv bikaribe derbarê hizr, îdeoloji an têgehekê de argumanekê berpêş bike û bikaribe sifetekê (li jor, ‘xirab’) lê bike, pêşî divê ew hatibe famkirin an analîzkirin. Hê di rûpela pêşî de ji me re tê gotin ku neteweperwerî tiştêkî çiqas xirab e. Hewldanek tuneye ku bi rêbazeke îlmî mixatabê xwe qanî bike. Wek sedema xirabiyên neteweperweriyê, “zihniyet” a desthilatdarî û dewletê tê raberkirin.

Desthilatdarî di maneya xwe fireh de ew hêz e ku dikare hiyerarşî ava bike; dikare şikil bide tevgerên kesan, bibe sedema tirsê, rizayê hilberine. Makro û mîkro desthilatdarî heye. Desthilatdariya makro ew hêza siyasî ye ku sazîyên civakî bi rê ve dibe. Desthilatdariya mîkro, ji têkiliya navbera du kesan bigre, heta ziman, çand, zanistê de şopên wê xuya dike. Desthilatdariya makro ji ya mîkro jî dikare bi riya şideta qebe jî pêk were, dikare bi riya amrazên nerm ên ku bikaribin bi awayekî bertekan bêtesir bike jî pêk were. Dîroka her du cure desthilatdariyê jî bi qasî dîroka mirovayetiye kevn e lê dikare li gor dem û mekanê şikil û naveroka wan biguhere. Qasî ku em dizanin civakeke bê desthilatdarî çênebûye; ew ê çêbibe an nebe ev nayê zanîn.

Ocalan bi xwe serokê rêxistinekê ye ku xwe dispêre desthilatdariyeke xurt ligel hêza çekdar ku berbiçavtirîn, hişkîtirîn, mezintirîn amûra desthilatdariya navxweyî ya kurdan e. Rêxistin bi xwe jî xwe dispêre hiyerarşîyeke hişk ku li jorî wê hiyerarşîyê Ocalan bi xwe heye. Ger wî bi xwe hewl bidaya jiyaneke bêdesthilatdarî, bêotorîte, bêhiyerarşî biji lê ne serokê rêxistineke çekdar bûya, ev fikir û argumanên wî dibe ku hêjayî nîqaşeke berfirehtir bûna.

Dewlet, bi pênaseya wê ya herî kurt û berbelav, ew rêxistin e ku xwedî pawana emilandina şidetê ye û di civakê de tekane hêz e ku emilandina şidetê jê re rewa ye. Bi vê maneya xwe, desthilatdariya makro an desthilatdariya siyasî pir nêzîkî hev in û gelek caran, wek gotin, dikare li şûna hev bîn emilandin. Loma bikaranîna herduyan bi hev re bêtir wek îsrafkirina gotinê an bêtir wek armanca xurtkirina argumanê (ger arguman be!) xuya dike. Ji herduyan yek bê rakirin, ji gotinê zêde tiştêk kêmtir nabe. Maneyek din a dewletê jî, awayê birêxistinkirina siyasî ya civakê an temama sazîyên civakekê ye. Îjar, ev herdu têgehên bi qasî dîroka mirovayetiye kevn, çawa dikare bi têgeha neteweperweriyê ku du sed sal temenê wê heye, hatiye têkildarkirin? Ger îro sistema dinyayê ne li ser esasê netewe-dewletan bûya lê, wek mînak, împêratorî an dewlet-bajar bûya, gelo em ê ji desthilatdarî û dewletê azade bûna? Na. Ger utopyayên bêdesthilatdarî an bêdewlet hebin, ku hene, pêkanîna van utopyayan hedê me kurdan e gelo wek geleki ku hê li ser du saet dersên kurdî

yên bijarte nîqaşên mezin dikin, hewl didin zimanê xwe bi serdestê xwe û heta bi hev bidin qebûlkin?

Yek ji argumanên derheq dewletê de ew e ku “maneya dewletê şer e. Heft hezar salên dawî yên diroka mirovayetê de tenê çend sedsal bê şer derbas bûye. Ev ji ber hebûna dewletê ye.” (r. 102). Pênaseya sosyolojîk a dewletê, awayê xwe-organîzekirin û xwe-rêvebirina civakan e. Civak tunebe civat heye, dewlet tunebe, eşîr, qebîle û komên din ên tengtir hene. Dema organîzasyon tengtir dibe, şer ji holê ranabe, ranebûye. Di diroka me û îroya me de jî, di diroka cihanê û îroya cihanê de bi hezaran minakên vê hene. Dîsa jî, baş e em li ser dewlet û şer nîqaş bikin lê di vê nîqaşê de çima em li aliyê din jî nenêrin? Dewlet, di heman demê de, ew hêz e ku merivên li nav sinorên xwe diparêze ji êrişên derve û êrişên ji nêzikî me jî. Berdewamiya hebûna civaka xwe, çand û nîrxên wê dabîn dike. Bi riya saziyên cûrbicûr jiyana endamên civaka xwe hêsantir, mirefehtir dike. Wan şert û mercan dabîn dike/dikare bike ku endamên civakê potansiyela afirîneriya xwe bi kar binin. Endamên civaka wê dewletê biçe aliyekî din î dinyayê jî, dizane ku li pişt wê/î dewletek heye, li gor hêz, îtibar û navê dewleta xwe miamele dibîne; welatîyê xirab-tirîn û lawaztirîn dewletê jî dizane ku ew tabiyî hiqûqekê ye, ew di nav wê çarçoveyê de tê naskirin.

Helbet Ocalan hewce nabîne bi dorfirehî qala dewletê bike, tenê qala fonksiyonek wê dike. Neteweperweriya gelekî bêdewlet û kolonîkirî pêşî armanc dike wî gelî bike xwedî statuyeye siyasî ku bikaribe xwe bi rê ve bibe, ji bin tehekuma hêza kolonyalist derxe. Encam bi her awayî teqabîlî dewletê an niv-dewletê dike. Neteweperweriya kurdi jî ne li derveyî vê pênaseyê ye ku dema bigihêje armanca xwe ne tenê Tirkiye, Îran, Iraq û Sûriye wê ne welatên îro be, ne diyar e wê bi çi awayî li ser xwe bimînin. Ev tê wê maneyê ku statukoya Rojhilata Navîn wê hilweşe loma potansiyela wê ya hilweşîner mezin e. Ji ber vê, ji bo neteweperwerî bê bêqîmetkirin divê fikra dewletê jî ji peywendî xwe bê derxistin û bêqîmetkirin. Bi gotineke din, ger di himê neteweperweriyê de fikra dewletbûnê tunebûya, Ocalan ewqas jî hêja nedidit ku li ser bifikire û li dijî wê argumanan biafirîne; esasê dij-neteweperweriya wî dewletbûn e, lê dewletbûna kurdan e.

### **“Sedema pîrsgirêkên Rojhilata Navîn neteweperwerî ye”**

Ji derve hatina neteweperweriyê û neguncavbûna wê ji bo civakên rojhilatî dibe alaveke gotarên dij-neteweperwer. “Neteweperwerî ji derve hatîye îthalkirin bo Rojhilata Navîn loma sedema sereke ya pîrsgirêkên wê neteweperwerî ye. (r. 11) Tiştê herî zêde xisar daye gelên Rojhilata Navîn, jî dogmatîzma dîn bêtir neteweperwerî ye.” (r. 13) Fikra neteweperweriyê di destpêka sedsala bîstemîn de li Rojhilata Navîn bû xwedî bandor û rast e ku pîrsgirêkên Rojhilata Navîn kêmtir nekir. Fikra neteweperweriyê bi ban-



dora Ewropayê tenê nehat Rojhilata Navîn, tovê xwe avêt her derê cihanê; çû welatên Skandinavyayê ji. Îro welatên Skandinavyayê modelên erênî yên neteweperweriyê ne, lê behsa wan nayê kirin. Helbet ev model nabe tenê bi neteweperweriyê re bê îzehkirin, gelek îzehatên din ên dirokî, sosyolojîk, cografîk hene. Ew ê tengbînî û bêdîrokîkirin be ku, meriv pîrsgirêkên li herêmekê, an modeleke erênî an neyênî, tenê bi sedemekê an fikreke du sed salî îzeh bike bêtî ku li beriya wê û hokarên din binêre.

Û tiştê ji derve hatiye Rojhilata Navîn ne tenê ev e. Fikra sosyalîzmê jî ne aidî axa Rojhilata Navîn e. Fikra sosyalîzmê jî li welatên ewropî di nav şertên aborî-civakî de şikil girt û ji Ewropayê belav bû, lê bi qasî neteweperweriyê temendirêj û mayînde nebû. Dema Ocalan û rêhevalên xwe bi armanca Kurdistanêke sosyalîst derketin rê, mîna pîraniya rêxistinên kurd ên dema xwe, li hemberî fikr û îdeolojiya neteweperweriyê sekinîn. Lê niha tenê neteweperweriyê rexne dikin û bêqîmet dikin. Ji xwe rêxistineke kurd a neteweperwer, xurt û xwedî bandor jî çênebû li bakur ku ji wan re bûbe asteng, rê li ber wan girtibe. Ewçax çima neteweperwerî ewqas dibe mijara rexneyan? Çima wê ji xwe re wek reqîb dibînin? Dibe ku ew bi xwe jî pêş ve li heqîqetê hay bûbin lê dixwazin wê veşêrin, sedema hebûna wan bi xwe ev be.

Ger neteweperwerî ne aidî axa Kurdistanê û Rojhilata Navîn be, sosyalîzm jî wê gelekî dûrtir e ji axa Kurdistanê û Rojhilata Navîn. Ji bo vê, em li Kurdistanê û Ehmedê Xaniyê jî vê axê derketiye binêrin, em ê bikaribin bibînin ku neteweperwerî ne dûrî me ye û bi temamî ne îthal e jî bo me. Kesên zanîna wan jî mufredata lîseyê ne wêdetir be jî wê bizanibin, berî ku neteweperwerî were, Rojhilata Navîn ne gulistan bû. Dema Împeratorîya Osmanî ber bi Rojhilat (û Rojava) ve fireh dibû û welatên din dagir dikir, li Ewropayê jî fikra hê neteweperwerî hê geş nebûbû. Êran û Osmanî digel ku ehlê heman dîni bûn, mezhebên wan cuda bû, dijberiya wan jî dijberiya neteweyî ne kêmtrir bû, heta zêdetir bû. Serdema netewe-dewletan jî bo wan bi xêrtir bû ku dev ji serê hev berdan, aşt bûn û bi hev re vegeeriyên ser me.

### **“Neteweperwerî asteng e li ber azadî û demokrasiyê”**

Neteweperwerî, navê hemû tevger, gotar, kiryar û fikrên jî bo bîdestxistina azadiya neteweyekê û dabînkirina sêdaqat û hestên aidiyetê yên endamên wê neteweyê ye; azad be da ku xwe bi rê ve bibe, xwe birêxistin bike, bikaribe siberoja xwe diyar bike, çanda xwe, hebûna xwe biparêze. Tiştê endamên neteweyê seferber dîke fikra azadiya kolektîv e ku ji serdestên xwe veqete û bikaribe xwe birêxistin bike. Di gotinên Ocalan ên mîna, “Ji aliyê azadî û demokrasiyê, û parastina hebûna kurdan neteweperwerî xeter e. Li ber azadî û demokrasiyê asteng e. Têkoşîneke azadî û mafan a jî neteweperweriyê dîr dikare derfetên bîdestxistina daxwazên demokratîk ên neteweyî (bi tirkî, ne “milliyetçi” ye, “ulusal” e, li vir ferqa herdu peyvên çî ye ne diyar e) û mafên

bingehîn zêde bike.” (r. 17) û di temama pirtûkê de jî, nayê famkirin ka gelo neteweperwerî çawa rê digre li ber azadiyê an li ber kijan azadiyê rê digre. Ji bo demokrasiyê jî eyn tişt dikare bê gotin; ne diyar e ka behsa kijan demokrasiyê dike, demokrasiya Tirkiyeyê an demokrasiya nav kurdan bi xwe? Ger demokrasiya Tirkiyeyê be ew têra xwe bixisar e ji xwe, neteweperweriya kurdî wê çawa xisareke mezintir bidiyê, ne diyar e. Ji xwe sistema Tirkiyeyê xwe li ser tunebûn û vederkirina me kurdan ava bûye, ên xisarê jê dibîne em in. Ger demokrasiya nav kurdan bi xwe be, civakeke ne azad be û nikaribe xwe birêxistin bike, zehmet e meriv qala demokrasiya wê bike. Demokrasi hiqûqa navxweyî ya civakê ye, awayek ji awayên peymanî civakî ye ku tê de her ferd, her rengê civakê xwedî derfetên wekhev be li hemberî zagonên wê, di diyarkirina awayê rêvebiriyê de.

Bi “tekoşîneke azadî û mafan” qest çî ye, nayê zelalkirin ka azadiyeke çawa an ew maf çî ne. Ji bo gelekî di bin tehekuma çar netewe-dewletên cîranê xwe de, ger azadî û mafê diyarkirina çarenûsiyê ku neteweperwerî vê armanc dike, nabe mewzûbehîs ev çî cûre azadî û maf in? “Bîdestxistina daxwazên demokratîk ên neteweyî” ya bê neteweperwerî îcadeke bêkêr e ku kes nizane binê wê çawa tê tijikirin. Ji îfadekirina fikrê bêtir wek hewldana şêlûkîrînekê xuya dike. Di tirkî de peyvên *ulusal* û *millî* di maneya “neteweyî (*national*)” de ne; ji bo “neteweperweriyê (*nationalism*)” jî du peyv hene, *milliyetçilik* û *ulusalçılık*. Wek mane, hema hema ferq tune ye navbera wan de lê *milliyetçilik* bêtir (ne temamî) ji aliyê tirkên mihefezekar û xeta rastgir tê bikaranîn; *ulusalçılık* jî aliyê tirkên kemalist, çepgir, laîkperest û yên tirkîyeke “xwerû” jî bandora erebî azade diparêzin, tê bikaranîn. Ji ber ku partiyeke nijadperest a tirkan bi navê Partiya Tevgera Neteweperwer (Milliyetçi Hareket Partisi-MHP) jî heye, peyva *milliyetçi* xwedî întibayeke pir neyênî ye. Û yek jî sedemên ku li Tirkiyeyê têgeha neteweperweriyê darazên neyênî di xwe de dihewîne ev e. Dema Ocalan dixwaze fikra neteweperweriyê bêqîmet bike, gotina *milliyetçilik* bi kar tîne lê dema nikare ji têgeha “neteweyî” bireve an pêwîst be bi sedemên pragmatîk bi kar bîne, peyva *ulusal* bi kar tîne. Ji ber ku ev jî wek “neteweyî” dikare bê wergerandin bo kurdî (ne tenê di kurdî de, di zimanê îngilîzî de jî tenê “nationalism” heye, peyveke din di heman maneyê de tune ye), ewçax mesele aloztir dibe, nêrineke ewqas li dijî neteweperweriyê bi “daxwazên demokratîk ên neteweyî” dixwaze çî bibêje? “Daxwazên neteweyî” yên ne-demokratîk kijan in? Dema peyva “demokratîk” lê tê zêdekirin, “netewetî” jî maneyên xwe yên neyênî, li gor Ocalan, azade dibe? Maneyek din werdigre?

“*Hemû civakên li dinyayê dikarin neteweperweriyê biparêzin, tişteki erênî tê de bibînin li gor xwe an teoriya wê çêbikin, lê ji bo kurdan nikare ti aliyekî wê erênî hebe... Demokrasi û neteweperwerî nabe werin ba hev. Li kuderê neteweperwerî hebe, li wir despotizm, desthilatdari, devlet hakim e.*” (r. 19)

Nayê gotin bê çima *hemû* civakên dinyayê li aliyekî kurd li aliyekî. Dema kurd mewzûbehîs bin, neteweperwerî dibe asteng li ber azadî û demokrasiyê. Ocalan ne zanyar an lêkolîner e; ew siyasetmedar e. Wek siyasetmedarekî kone û manipulatîv, di şêlûkirinê hişê xwînerê xwe de zîrek e. Têgehhan ji peywenda wan a dîrokî û civakî derdixê û bi ser xwînerê xwe ve dirijîne. Xwînerê ku berê ji devê siyasetmedarekî kurd ev têgeh nebihîstine, maneyeke efsûnî li wan bar dike. Dema ev siyasetmedarekî qarizmatîk û serokê rêxistinekê be, wiha xuya dike wek ku bi rastî jî tişteki pir grîng, bêhempa dibêje; nabe mijara pîrslêkirinê. Û dema kurdan ji hemû gelên din vediqetîne, datîne aliyekî, ew întiba çêdibe ku statuya gelê kurd tê bilindkirin. Halbûkî bi vê uslûbê kurdan bi temamî bêstatu dihêle an derdixê asteke metafîzîk û razber ku li derveyî nîqaşên şênber an mizakereyên şênber, reel dihêle. Kurdan li ezmanan digêrin, nahêle lingên wan bi erdê bibe.

### **Têkiliya dewlet û neteweperweriyê bi mafên jinan re**

Têkiliya neteweperweriyê bi feminîzm û mafên jinan re, gelek caran, guman çêkiriye di aleyhê mafê jinan de û xwe daye nîqaşkirin li nav feminîstên cihanê. Lê, ev nîqaş, ji ber nerînên Ocalan, ji hedê xwe derketiye di nav kêmtirîn bist salên dawî de. Bi nêrîna Ocalan “li navenda neteweperweriyê civatên mêrane (masculine) hene. (r. 19) Dewletparêzî û desthilathezî neyartiya jinan e. Neteweperwerî jî zihniyeteke neyarê jinan e. (r. 268)” Mîna her civakê, nivê gelheya civaka kurd jî ji jinan pêk tê. Loma herî zêde nêrînên Ocalan ên derheqê jinan de belav dibin û dikevin rojevê. Pêşî divê bê destnîşankirin ku gelek tecrubeyên dinyayê yên feminîst, ji bo mafên jinan bi dest bixin bi neteweperweriyê re tevkari kirine. Ji Kanadayê heta Filipînê, ji Filistinê bigre heta Hawayiyê, ji Koreya Başûr bigre heta Îrlandayê. Gelek caran di navbera neteweperwer û feminîstan de nîqaş, nelihevî çêbûne lê, bi taybetî li welatên paşê serxwebûna xwe bi dest xistine an hewl didin bi dest bixin, gotareke wiha wek a Ocalan peyda nebûye û neteweperwerî bi temamî wek neyarê jinan nehatiye dîtin. Xala hevpar a di piraniya mezin a tecrubeyên li cihanê ew e ku modelên erênî pêşkêşî me dikin; di encama piraniyeke mezin a tevgerên neteweperwer de mafên jinan pêş ketine.<sup>7</sup>

<sup>7</sup> Ji bo bêtir agahiyên li ser têkiliya feminîzm û neteweperweriyê, bnr. Ranjoo S. Herr, “Derfeta Feminîzma Neteweperwer” <http://blog.kovazararema.com/derfeta-feminizma-neteweperwer/>; A. Lois West (ed.), *Neteweperweriya Feminîst*, wer. F. Adsay, Avesta, Stenbol, 2021; Lina Sunseri, “Ji Dijberiya Feminîzm û Neteweperweriyê Wêdetir: Riwangeyeke Feminîst a Dij-Mêtinger li ser Têkoşîna Rizgariya Aborijînan” di vê hejmara *Zaremayê* de; Ruth Halperin-Kaddari û Yaacov Yadgar, “Navbera Feminîzma Gerdûnî û Neteweperweriya Ne-gerdûnî de: siyaset, dîn û (ne)wekheviya zayendên civakî li Îsrailê”, di vê hejmara *Zaremayê* de; F. Adsay, “Milliyetçiliğin Feminist Savunusu”, di nav *Kürt Çahşmaları: Bahar Akademisi*, Weşanên Weqfa İsmail Beşikci, Stenbol, 2020; Hee-Kang Kim, “Should feminism transcend nationalism? A defense of feminist nationalism in South Korea”, *Women’s Studies International Forum*, Forum 32 (2009) 108–119, journal homepage: [www.elsevier.com/locate/wsif](http://www.elsevier.com/locate/wsif).

Meseleya jinan an wekheviya zayendên civakî meseleyeke hesas û grîng e û meriv cara pêşî ji dibihîze pê kêfxweş dibe helbet û dema ev ji devê serokê rêxistineke siyasî derdikeve ji bêtir bal dikşîne. Lê dema meriv lê dikole û gotarên Ocalan, endam û sêmpatîzanên rêxistina wî yên vî warî de tine ba hev, tê dîtîn ku sedema berpêşkirina vê meseleyê ne ew e ku wekheviya zayendî bê rûniştandin li nav civaka kurd. Wek mijareke guncav hatiye dîtîn ku pê fikra neteweperwerî bê bêqîmetkirin. Neteweperwerî û mafên jinan wek dijberên hev tê nîşandan; bavsalarî û neteweperwerî wek encamên hevdu an hilberînerin hevdu tîn nîşandan. Ji ber ku meseleya mafên jinan mijareke modern e, li cihanê piranî aktuel e û yek ji nîşaneyên pêşverûtîyê ye, îmajeke pir erênî dide rêxistinê. Bilakîs, neteweperwerî bi qasî feminîzîm û mafên jinan ne xwedî îtibar e; wek îdeolojiyê li hemberî sistema heyî ya li herêmê û cihanê, û statuko-hilweşîner, bi zanebûn bi nijadperestiyê re tê yekkirin. Dema meriv bixwaze di warê mafê jinan de projeyekê bide meşandin an çalakîyê bike, ne zehmet ji piraniya weqif, înstîtû û sazîyên din ên mîna yên Yekitiya Ewropayê û hwd., sponsor bê peydakirin û teşwîqan werbigre. Lê gelek astengî hene li ber fikra neteweperwerî û propaganadaya wê, proje û xebatên derbarê wê de. Rexnekirina neteweperweriyê piranî rewşa û maqûlî tê dîtîn; gotara neteweperwer mecbûr e di qadeke teng de tevbigere. Lê qada ku mehhûma mafê jinan û feminîzîm tê de tevbigere gelekî firehtir û berbelav e. Loma neteweperweriya kurdî (an tenê 'neteweperwerî'), ji aliyê Ocalan ve, herî baş dikarîbû bi gotara derbarê mafên jinan bê bêqîmetkirin. Ji ber ku bi saya vê dikare rê bigre li ber gelek bertekên li dijî rêxistin û siyaseta xwe an dikare wan minimize bike, nermtir bike, çî li nav me çî li derveyî me. Dema çalakgeriya jinên nêzî PKKê, seferberkirina wan a girseyî û beşdariya wan a nav qada siyaseta tê dîtîn, ev bi xwe wek pêşketîneke grîng tê dîtîn. Lê nexuyakirina nasnameya neteweyî ya jinên kurd, bêparhiştina jinên kurd ji kurdbûn, Kurdistanîbûnê û mafên wan ên kolektîv ên neteweyî nayên problematîzekirin. Neteweyîbûn wek berdêla mafên jinan û çalabûna wan tê pejirandin.

Îhtimal e, ji ber ku kurdbûn di serê me de jî bi paşverûtî û pre-modernîbûnê re ewqas bûye yek ku em gelek caran mafên jinan, wekheviya jin û mîran nîkarin di nav kurdbûnê de bi cî bikin an ligel hev bifikirin. Loma ji bo bêqîmetkirina kurdbûn û neteweperweriya wê dibe alaveke kêrhatî. Dema gotara Ocalan a derbarê mafên jinan tê rojevê, wek ku jinên ku ne aidî civaka kurd bin, ti tiştekî wan hevpar bi mîrên kurd re tunebe, ew jî "jinistan"ê bin, miamele dibîne, Kurdistan an kurdbûn bi rihetî li derve tê hiştin, adeta layiqî meseleyê ewqas modern nayên dîtîn. Halbûki feminîzîm fikreke çiqas modern be, neteweperwerî jî ewqas modern e.

Neteweperwerî wek mefhûmeke aidî du sed salên dawî, helbet, di nav xwe de hêmanên bavsalar hewandiye û dihewîne. Ji ber ku bavsalarî mefhû-

meke bi hezaran sala ye, ne mantiqî ye ku meriv li bende be neteweperwerî ji bavsalarîyê şuştî be. Ew jî mîna her fikir û îdeolojiyê berhema peywenda serdemê ye û ne sabit e, guherbar e. Ew jî vekiriye ji rexne, nîqaş, mizakere û guherînê re û guherîye jî li gor dem û mekanan; ev guherîn didome û ger em ji guherîna hilberînên mirovî bawer bin, ew ê bidome jî. Tiştê şikil û naveroka guherîna wê diyar dike, hêz û çalakgeriya jinan e ku nivê endamên neteweyê pêk tînin. Çalabûn û beşdarbûna jinan bo siyaseta neteweyî dikare kurdbûnê bi xwe û fikra neteweperweriyê bi hev re biguherîne. Bes, jinên kurd neteweperweriyê wek neyarê xwe nebinin, jê dûr nekevin û wê di destê mîrên kurd de nehêlin; hewl bidin wê biguherînin li gor berjewendiyên xwe.<sup>8</sup> “Netewe tenê nayê maneya civateke xwedî çandek û tecrubeyên dirokî yên hevpar, ew kolektiviyek e ku ‘berê wê ber bi siberojê ve ye’ (Yuval-Davis).”<sup>9</sup>

### **“Pêşengên neteweperweriyê cihû ne û di qirkirina wan de para wan bi xwe jî heye”**

Yek ji gotarên dij-neteweperwer ên herî balkêş ku bi riya Ocalan belav bûne, ya derbarê cihûyan de ye. Tecrubeya cihûyan a dewletbûnê û vegera wan a ji çar aliyên dinyayê bo welatê xwe yî qedim û vejandina zimanê xwe bûyereke grîng e û tîji ders in ji bo me kurdan ku ji aliyê çar dewletan tunebûna wan hatiye hedefkirin. Her çiqas rewşa me û ya wan yek bi yek ne mîna hev be jî, diviyabû em bêtir li ser tecrubeya wan sekinîbûna. Ev ne tenê îhmala PKKê ye lê îhmala hemû rêxistinên kurdan û neteweperwerên kurd (ên Bakur) in jî. Celadet Eli Bedirxan di kovara *Hawarêde* bala xwînerên xwe kişandiye ser qehremanê vejîna zimanê îbrani Eliezer Ben-Yehuda.<sup>10</sup> Piştî vê cihû zêde neketiye rojeva me ji bilî çend hewldanên 70-80 sal şûn de. Di 2014an de nivîseke dişa li ser Eliezer Ben-Yehuda di kovara *Zaremayê* de derketiye.<sup>11</sup> Di sala 2021an de jî kitêba Theodor Herzl, *Dewleta Cihûyan* bi kurdî hat weşandin û ket rojeva xwînerên kurdî.<sup>12</sup> Qasî dizanim, di nav gotarên Ocalan û rêxistina wî de gotareke ku bi erênî îşaretî tecrubeya wan a dewletbûn û vegera bo welêt bike tune ye. Ji dêvla vê, bi awayekî pir neyênî, heta antî-semitik behsa cihûyan dike di nav behsa diroka neteweperweriyê de:

Cihûyan jî roleke grîng listine di geşbûna neteweperweriyê de. Ji ber ku di

**8** Ji bo parastina neteweperweriyê bi riwangeyeke feminist, bnr. F. Adsay, “Milliyetçiliğin Feminist Savunusu”, di nav *Kürt Çalışmaları-Bahar Akademisi*, weş. Weqfa İsmail Beşikci, sal 2020, Stenbol.

**9** Lina Sunseri, “Ji Dijberiya Feminizm û Neteweperweriyê Wêdetir: Riwangeyeke Feminist a Dij-Mêtinger li ser Têkoşina Rizgariya Aborijînan” di vê hejmara *Zaremayê* de.

**10** Herekol Azizan, “Zilamek û Zimanek”, *Hawar*, hej. 40, sal. 1942, r. 4-5.

**11** Jeff Kaufman, “Vejandina Zimanê Îbrani”, *Zarema*, hej. 1, sal 2014, r. 26-35.

**12** Theodor Herzl, *Dewleta Cihûyan*, wer. Fahriye Adsay, Avesta, 2021, Stenbol.

bingeha wê [ya neteweperweriyê] de îdeolojiya cihû (qebileti, neteweperwerî û siyonizma wê) heye... Cihûyan ev fikrên xwe xistin nav Almanayê, û Hitler wan afirand. Berê *hemû* (italik aidî min in, F.A) neteweperweriyên wan diyar kirine. *Her* neteweperwerî siyonîzm e... Tê gotin, cihû dinyayê bi rê ve dibin, na ev ne rast e. Kapitalîzm dinyayê bi rê ve dibe lê bi riya îdeolojiya cihûyan [bi rê ve dibe]. Cihû, wek ticar û banker, di avabûna *her* netewe-dewletê de ji xwe re ci diditin. Bi riya netewe-dewletan, sermiyana xwe wê gavê mezin kirin. Li aliyekî li hemû cihanê sermiyana cihûyan mezin dibû, li aliyê din jî zidê xwe diafirand... bûn sedema qirkirina civatên cihûyan ku divê wek berpirs-yarên vê nehatina ditin... heta hatina Hitler, cihû xurttirin neteweperwerên Almanayê bûn... di geşbûna neteweperweriya Îtihat û Terakkî de ji ku bû seba hilweşîna dewleta osmanî, rola cihûyan tê zanîn... Pozitivîzm-neteweperweriya cihûyan... ne tenê qirkirina cihûyan, *hemû* qirkirinê fizîkî û çandî yê li cihanê afirandin...*hemû* neteweperweriyên diranên xwe çiq kirin ji bavê [ji cihûyan re] xwe re... Hemû neteweperwerên Ewropayê cihû wek berpirs-yar ditin ji bo kêşê û astengiyên li ber xwe. Gelek lêkolîn pêşrast dikin ku tîkiliyeke diyalektîk heye di navbera cihû û cihûtiya li Almanayê, û neteweperwerî û faşîzma alman de... Neteweperweriya cihû ne tenê neteweperweriya neteweyêke piçûk e, *neteweperweriya ahanê* ye. Bavê *hemû* neteweperwerî û netewe-dewletan e. Çi hef e ku, cihû bûne mezintirîn qurbanîyên vê.<sup>13</sup> ... Hitler ji tekçûna almanan [a Yekem Şerê Cihanê] cihûyan berpirs dibîne. Vê pir baş dibîne: Sedema raserbûna Londrayê ji ber îdeoloji û neteweperweriya cihûyan bû. Îxaneteke mezin hatiye kirin li almanan. Berpirs cihû ye... Antî-cihûti li her derê wisa çêbûye (li Fransayê bûyera Dreyfûs). Dibe ku bê îbatkirin ku ne wiha ye. Lê çima hê ji ev fikir berdewam e li her aliyê cihanê? Wek minak, herî dawî Serokkomarê Îranê Ehmedîneqad ev got. Ji ber ku îdeoloji û neteweperweriya cihûyan hê ji li cihanê îdeolojiya pêşeng e, eyn mîna pawanên sermiyanê.<sup>14</sup>

Ji temama vê jêgirtina dirêj tişta pêşî li ber çavê meriv dikeve, antî-semitîzm e. Ew pêşdaraza ku bi sedansalan e li dijî cihûyan tê emilandin ku xwedî sermiyaneke mezin in û dixwazin temama cihanê têxin bin kontrola xwe, bi fikra neteweperweriyê ve hatiye girêdan. Bêqîmetkirin û nerewakirina fikir û îdeolojiya neteweperweriyê bi riya pêşdarazên antî-semitîk tê xurtkirin. Hemû ev agahiyên li jor yek jî xwe naspêre delîlekî an hewce nayê ditin ku bi riya çavkaniyên ilmî bîn piştrastkirin. Bi van îdiayên bê bêbingeh ji aliyekî ve antî-semitîzm jî ji nû ve tê hilberandin, ji aliyekî din ve jî tê xwes-

**13** Abdullah Öcalan, "Kapitalist Modernitenin Toplumsal Doğaya Müdahalesi", *Dipnot*, hej. 5, sal. 2011, r. 79-91. Di *Bir Uygurluk Hastahğı Milliyetçilik* de ji ev nêrin ci digrin (r. 143-145) lê neqilkirina ji vê nivîsê hêsantir bû loma ji vir hatin girtin.

**14** Sinan Yoldaş, *Bir Uygurluk Hastahğı Milliyetçilik*. r. 142.

tin fikir û hestên neteweperwer bi riya îdiayên *qašo* mezin bèn pûçkirin. Berriya her tiştî, siyonizm û neteweperwerî tê tevlihevkirin. *Siyonizm* navê neteweperweriya cihûyan e; ev têgeh bi îbrani ye û tenê aidi wan e. *Siyon* navê girekî ye li Qudsê lê ji bo binavkirina Îsrailê jî hatiye emilandin. Siyonizm jî hedefkirina vegeza bo Filistinê û avakirina dewleteke cihûyan îfade dike. Di gotina “her neteweperwerî siyonizm e” disa ji bo bêqîmetkirina fikra neteweperweriyê şohreta xirab a peyva siyonizmê tê gazîkirin; ji manipulekirina hiş pê ve sedem nayê ditin an nayê famkirin. Dizane ku peyva siyonizm, îmajeke wê xirab heye di hişê kurdên oldar, û kurdên sekuler ku di bin bandora çepgiriya tirkan û kemalizmê de mane/dimînin.

Belê, neteweperweriya cihûyan xwedî taybetmendiyê cuda ye ji yên din. Ji ber ku baweriya wan a dinî ew ji gelên din veqetandine an cihê kirine, sînorê navbera wan û gelên din diyar kiriye; rehên neteweperweriya cihûyan li gor neteweperweriyên din ên li Ewropa kûrttir diçe. Lêbelê, her neteweperwerî dinamikên wê yên civakî, aborî û dirokî, rê û rêçên tê re derbas bûne ji yên din cuda ne; xwedî taybetmendiya cuda ne; demên cuda bi dinamikên cuda peyda bûne/dibin. Derbarê peydabûna neteweperweriyê de gelek teoriyên cuda hene. Mînak, teoriya marksîst neteweperweriyê bi lêgerîna çîna birjuwa ya ji bo bazareke sînorên wê diyar ve, girê dide. Zanyarên mîna Ernest Gellner, geşbûna neteweperweriyê bi pêdiviyên civaka modern û belavbûna “çandêke bilind” bi rêya bisazîbûna perwerdeya giştî ya standard ve, girê dide. Anthony Smith neteweperweriyê bi komên etnik ên pêş-modern ên xwedî ziman, çand, sembol, mît û efsaneyên hevpar, girê dide. Benedict Anderson bi kapitalîzma çapxaneyê û zimanên gelêrî ve îzeh dike. Ji bo gelên mêtînghekirî, neteweperwerî bûye rêbaz û îdeolojiya rizgariyê. Bi riya neteweperweriyê xwe li hemberî hêzên mêtînger organîze kirine û saz kirine. Pir balkêş e ku nivîseke ewqas bêbingeh, ji rê û rêbazên ilmî bêpar di kovareke akademîk de hatiye çapkirin. Diyar e edîtor û lijneya kovarê, ji ber nivîskarê wê, ev nivîs wek ayet pejirandine û qet midaxele an rexneyêke edîtoriyal lê nehatiye kirin. Pirseke ilmî lê nehatiye kirin.

Cihû bi xwe jî, her çiqas bi saya baweriya nasnameya xwe ya dinî parastibin jî, fikra neteweperweriya modern (an siyonîzma modern) di sedsala 19mîn de bi saya serhildanên gelên balkan û Ewropaya Navîn ên li hemberî Dewleta Osmanî û Împeratoriya Awistîrya-Macarîstanê ket nav wan, bi taybetî ya bulgaran, û ya yewnanan li dijî osmaniyan, tevgerên neteweyî yên gelên çek û slovakî li dijî Awistîrya-Macarîstanê hwd. Wek mînak, vejînerê zimanê îbrani Eliezer Ben-Yehuda dema xortaniya xwe de diçe Parisê ji bo xwendina zanîngehê, bi bandora serhildana bulgaran dikeve bin bandora fikra neteweperweriyê û di nivîsa xwe ya bi navê “A Weighty Question”<sup>15</sup>

<sup>15</sup> Eliezer Ben-Yehuda, “A Weighty Question”, wer. ji îbrani. David Patterson, di nav Eisig Silbergshlag (ed.), *Eliezer Ben-Yehuda, A Symposium in Oxford*, 1981, Great Britain, South Wales.

(Meseleyeke Grîng-1879) de pêşniyarî cihûyan dike ku xwe bi fikra neteweperweriyê saz bikin, vegerin welatê xwe Filistinê, ji zilmê xilas bibin, wek neteweyeke serbixwe hebûna xwe biparêzin û bidomînin. Vejina zimanê îbrani jî wek grîngtirîn amraza neteweyîbûnê dibîne û dikeve nav hewldana vejan-dina wî. Nivîskarê *Dewleta Cihûyan*<sup>16</sup> (1895) Theodor Herzl berî kitêba xwe binivîsîne, û fikr û nexşeya dewletbûnê îlan bike, heyraneke çanda alman û Almanyayê, alîgîrêkî xurt ê entegerasyonê bû. Mîna her civakê, di nav civaka cihûyan de fikrên cûrbicûr hebûn derbarê siberoja xwe de. Hejmareke mezin alîgîrên entegerasyonê bûn, ên asimilasyon diparastin jî hebûn, ên siyonîzm diparastin jî hebûn. Ji bo armanca siyonîstan pêk were jî diviyabû jî mezin-tirîn qirkirinê re derbas bibûna.

Di wan gotinên li jor, yek ji xalên hevpar ên bi gotara anti-semitîk re ew e ku qurbaniyên qirkirinê dike berpîrsên qirkirinê. Heta ne tenê berpîrsên qirbûna xwe ne, sedema *hemû* qirkirinên fizîkî û çandî cihû ne. Her çiqas qaşo heyfa xwe li cihûyên feqîr tîne jî, xurttirîn argumanta anti-semitîk jî nû ve hildiberîne, qirkirinê rewa dike. Fail heq derdixe. Bi vî awayî him hişê kurdan careke din şêlû dike him di bin re bi qirkirinê tehdîd dike. Helbet, behs nake ku bi saya siyonîzmê (neteweperweriya cihûyan) cihû çawa vegeeriyên welatê xwe, dewleta xwe ava kirin, hebûna xwe kirin bin garantiyê û bûn endamên wekhev ên qada siyaseta cihanê.

### “Kurd sedema têkçûna xwe ne”

Çawa cihû ji qirbûna xwe berpîrs in, kurd jî ji têkçûnê xwe, êş û azarên xwe, siyaseta înkare û komkujiyên li dijî xwe berpîrs in li gor Ocalan. Ev têkçûn ji sedsala 19mîn ve dest pê dike, li gor Ocalan. Di vê sedsalê de ji ber xurtbûna dewleta osmanî serhildanên kurdan têkneçûn, ji ber ku aristokrasiya kurd (Ocalan dibêje çîna serwer (bi tirkî *egemen smf*)) li gor berjewendiyên xwe tevgeriyayê ne li gor berjewendiyên gel. Dibêje,

dema berjewendiyên wan ketiye xetereyê, dev ji gel berdane, ew li erdê hiştine. Vê aristokrasiyê nikaribû xitabî xelkê bike, pêşiya xwe nedidit û bi ser de gelê kurd ji bo berjewendiyên xwe dikir amûr û dibû sedema êşa giran. Li Rojhilata Navîn Îngilîz in afirînerê pîrsgirêkên ji ber neteweperweriyê. (r. 199) Li hemberî guherînê sedsala 19mîn ên li nav osmaniyan, terza jiyana aristokrasiya kurd jî xira dibû; *hewl didan desthilatdariya xwe bidomînin*. Sedema serhildanan ev bû. Mîrên ku dibûn pêşengên serhildanên kurdan kesên muhtela û tevkarên (*işbirlikçi*) hêzên derve bûn, her tim jî xwe re li palîştan digeriyan. (r. 175)

<sup>16</sup> Theodor Herzl, *Dewleta Cihûyan*, wer. F. Adsay, Avesta, 2021, Stenbol.



Ev berjewendiyên aristokrasiya kurd çî bûn, ew çawa winda kirin, ev nayê zanîn, tenê ev hevokên gişgir, gelemperikî, bêpeywend, êrişkar hene. Tê zanîn, sedsala nozdemîn ew sedsal e ku Dewleta Osmanî bi saya amûrên modern ên rêvebiriyê her çû siyaseta xwe xurtkir dikir û çavê xwe nedigirt ji desthilatdariyên herêmi yên ji navendê dûr. Serhildanên mîrektiyên kurd bertekek bû li hemberî vê siyaseta da ku desthilatdariya xwe ya li ser axa xwe bidomînin an xurttir bikin. Hewldana domandina desthilatdariya *xwe*, ji aliyê Ocalan, wek tohmet tê bikaranîn. Ev hewldan çima tişteki xirab be û bê reşkirin? Ji vê normaltir çî heye? Li aliyê din, siyaseta osmanî ya ji bo xurtkirina dewleta *xwe* normal tê ditin û bi zimanekî bêpêşdaraz tê qalkirin di pirtûkê de. Wek tişteki normal û li gorî herikîna dirokê tê şirovekirin. Osmanî li navendê tê rûniştandin, wek norm tê qebûlkirin. Yê li dijî vê desthilatdariyê serî hildidin tên sûcdarkirin. Ew hêza ku nehiştîye li ser axa Kurdistanê rêvebirîyeke aidî kurdan dirust bibe, a heyî ji ji hev belav kiriye, rê li ber her cure pêşketinê girtiye, hîm û binyada civakê ji hev xistiye rewa tê ditin lê aristokrasiya kurd a ku hewl daye *otorîteya xwe ya li ser axa xwe* biparêze ne-rewa tê ditin. Aristokrasiya kurd, bi qewlê Ocalan çîna serwer, di nav peywendê wê sedsalê de ew hez bû ku li ser axa Kurdistanê *otorîteya* kurdan, nixrên wan, hebûna wan temsil dikirin li hemberî hêzên dora *xwe*, loma ketine hedefa Ocalan. Em vê ji ku fam dikin? Em vê ji helwesta domdar a Ocalan fam dikin. Vê argumana *xwe* ji bo tevgerên kurd ên hema hema her serdemê, yê berî *xwe*, bi kar tîne. Îzahet an tehlîleke cuda ya civakî, aborî, siyasî nake ji bo serdemên berî an derveyî *xwe*. Yek ji van serdema Komara Tirkiyeyê ye.

Hemû tevgerên Bedirxaniyan ên li dijî Komara Tirkiyeyê bi temsilkariya îngilîzan û parastina xelîfetiye sûcdar dike, reş dike. Heta îdia dike ji ber vê ew her tim di bin hîmayeya îngilîzan de bûne. Armanca serxwebûna Kurdistanê wek îdeolojiyeke paravan bi nav dike. (r. 287) Serkeftina tevgera Mustafa Kemal ji *xwe* re esas digre û Bedirxaniyan sûcdar dike ku nexwestine ew bi ser keve, xwestine tevgera wî mihtacî îngilîzan bibe. Yanê, serokê “tevgera azadiya Kurdistanê” ji *xwe* re serkeftina wê hêza ku tune kirina kurdan kiriye armanc esas digre, serkeftina wê hêza îmhaker erênî dibîne, hewldanên kurdan ên li dijî wê hêzê bi tevkarîya (*işbirlikçilik*) îngilîzan sûcdar dike. Serhildanên kurdan ên serdema Komarê wek *sedema* komkujiyan, siyaseta înkâr-îmha û asimilasyonê penase dike. (r. 287) Pir eşkere ye ku, eyn mîna di qirkirina cihûyan de, di vir de ji failê komkuji û siyaseta înkâr-îmhayê heq tê derxistin, kirinên failê tê rewakirin, failê tê paqijkirin; qurbanî jî, wek sebebê van tê nîşandan û sûcdarkirin. Ka gelo li vir çî cudatî dimîne di navbera argumanên Komara Tirkiyeyê ku me di dersên *İnkilap Tarihi* (diroka înkilabê) de xwendine/dixwînin?

Serokê “tevgera azadiya Kurdistanê” dirokê bi hest û riwangeya tirkan û bi nêrineke dij-kurd dixwîne. Li jor siyaseta osmanî wek norm qebûl di-

kir û bertekên li dijî wê bêqîmet dikir, niha ji Komarê ji xwe re wek norm hildibijêre. Dibêje “di bin navê şoreşên komarê de hema hema her tiştê aidî osmanî ji holê hat rakirin; berteka ji ber vê û daxwaza *vegera bo osmanî* bû sedema serhildana Şêx Seîd.” (r. 214) Rêbaza xwendina Ocalan a dirokê rê nade qebûl bike ku aktorên kurdan ji hebûye û wan ji li gor derfet û feraseta xwe hewl dane mafên xwe, axa xwe, hebûna xwe û menfaetên xwe biparezin li dijî hêzên biyanî. Bi argumana meşhûr a mifredata *inkilap tarihi* dibêje îngilîzan rê daye serhildanê, ji ber ku meseleya Mûsilê di rojevê de bû. (r. 214)

Em bi rêbaza xwendina Ocalan dewam bikin: Divê aktorên kurd ên wê demê bêdeng temaşê bikirana li xwe-avakirina Komara Tirkiyeyê! Lê ew rihet nesekinin û serî hildan! Piştî serhildanê, bi vê hencetê, Qanûna Takrîrî Sukûn hat derxistin, aliyên mixalîf hatin cizakirin bi tohmeta îxanetê. Dadgehên Îstiqlalê hatin damezrandin li Kurdistanê û li Rojava [yê Tirkiyeyê]. Komareke tirsê hat avakirin. (r. 215) Ji ber vê û serhildanên piştî wê têkiliyên tirk û kurdan bêtir xirabûn, ji bihevrebûna gelan ku di destpêkê de armanc ev bû, hat dûrketin. (r. 216) Dîsa em kurd bûn sebeba siyaseta înkâr û îmhayê! Hewante serî hilnedana aktorên kurd ên serdemê, biratiya gelan —gotineke ku ne diyar e di jiyana reel a civakî de, siyaseta û hiqûqê de teqabili çî dîke— wê pêk hatibûya! Heta bi gotina ku “dadgehên îstiqlalê hatin damezrandin li Kurdistanê û *Rojava*” kurd wek sebeba tunekirina mixalîfên tirk ji tê nişandan û bi awayekî neyekser bi vê ji tîrên sûcdarkirin. Fail, careke din, ji gunehên xwe tê paqijkirin. Di behsa serhildana Koçgiriye de ji tê gotin ku serhildan bi saya feraseta Mustafa Kemal a di çareserkerina pîrsgirêkan de, zêde mezin nebûye. (r. 214) Halbûkî beriya vê ji gotiye hêzên leşkerî yên di bin fermandariya Sakallî Nurettin Paşa û Topal Osman de di 21ê Hezîrana 1921ê de raperin têkbin. “*Piraniya* kurdên herêma Koçgiriye bo Kayserî Sarizê hatin sirgunkirin.” Yanê ne ji feraseta Mustafa Kemal bûya, wê hê çî bibûya gelo?! Hewce nabîne vî aliyê veşêre jî —nikare veşêre ji ber eyanbûna wan—, ji bo qirkirina cihûyan jî ev dikir, kiryanan qebûl dîke lê failên wan heq derdixe û wan meşrû nişan dide, ji ber ku nêrîngeha (*standpoint*) wî li aliyê Komara Tirkiyeyê ye, ji aliyê kurdan ve nanêre. Ji bo çî? Çimkî ji navê pirtûkê diyar e ku fikra neteweperweriyê li ba wî çiqas bêqîmet e û armanca nivîsandina pirtûkê jî ew e ku kurdan ji vê dûr bixe. Ji ber vê yekê divê rê li ber xwendineke neteweperwer bê girtin. Hemû bûyer û tevgerên ku dikare wek pro-neteweperwer an neteweperwer bînin xwendin ji wê peywendê bînin derxistin; bira dirokî ya kurdan ku dikare bibe bingehe ji fikra neteweperweriyê re, divê bê şelûkirin. Heta divê pêşengên xwe, wek malbata Bedirxaniyan û pêşengên serhildanan, bêirade, bêkêr bibînin da ku ji xwe û pêşiyên xwe nefret bikin, êdînen xwe ji berz bikin ku nikaribin hewes bikin ji êdînen xwe veqetin, bidin dû mafên xwe yên kolektîv, hebûna xwe ya neteweyî saz bikin. Civakêkê dema carekê pêşiyên xwe bêqîmet kir, muadilê wan ên îro ji bêqîmet û bêkêr dibîne. Fikra

neteweperweriyê jî ew e ku hemû çin û tebeqeyên neteweyê seferber bike ji bo xwe-birêxistinkirin û xwe-sazkirinê. Nêrinên Ocalan ên derheq aristokrasiya kurd de, bilakis, dibe sedem ku siyaseta kurd êdinên xwe ji nav xwe diyar bike û berê xwe bide tunekirina wan.

### **Neteweperweriya tirkan û Mustafa Kemal Atatürk**

A rast, tišta ku Ocalan li dij e, bi israr li ser disekine ne neteweperwerî bi xwe ye. Tišta ew ji xwe re dike derd neteweperweriya kurdî ye. Yek ji delilên vê jî ew e ku dema behsa neteweperweriya tirkan dike, hema hema ti carî zimanekî dijber bi kar nîne; derbarê aktorên wê de gotinên neyênî an sifetên neyênî nayên bikaranîn. Wek diyardeyeke dirokî, bi zimanekî objektîv û bi referansên ji çavkaniyên cuda, behsa neteweperweriya tirkan tê kirin. (r. 204) Aktorê wê Mustafa Kemal jî her tim bi gotinên hurmetdar tê qalkirin. Hin encamên neyênî hebin jî, helbet, M. Kemal qet ji wan berpîrs nayê girtin an tê paqijkirin. Ocalan dibêje, “di pêvajoya bisazîbûna Komarê de, teolojiyek hatiye saz kirin li dor Mustafa Kemalê ku şexsiyeteke grîng e ji bo gelê tirk, û birrek derew hatine kirin. Mînak, gotina ‘Ne mutlu Türk’üm diyene!’ (Ew çi bextewerî ye ku meriv bêje tirk im!) ji aliyê M. Kemal nehatiye gotin, cihuyekî ev gotiyê” (r. 209) —ji pişt vê xirabiyê jî cihûyek derket! Ji xwe di destpêkê de “fikra M. Kemal ew bû ku mafê otonomiyê bide kurdan, biratiya gelan diparast. Lê hêzên derve her tim hêviya dewletbûnê dan kurdan, loma jî tirkan nema ji kurdan bawer kirin, ji wan ketin gumanan. Di encamê de derfeta pêkvejiyana gelan xisar dît.” (r. 200) Yanê paşê pîrsgirêk derketibin jî, di vir de rola M. Kemal bi xwe an siyaseta Komarê tune ye. Heta M. Kemal tenê hatiye hiştin, bi listikên îngilîzan ji siyaseteke hatiye derxistin. Yalçın Küçük gotiyê, “M. Kemal jî tê de, her kes ji İsmet İnönü ditirsiya û M. Kemal di eslê xwe de di pozisyona “zilamê duyemîn” de bû.” (r. 211) Digel ku her tim dewletê bi awayekî neyênî pê nase dike jî, dema dewleta tirkan dibe mijar, derbarê têgeha dewletê bi xwe de û dewleta nû-ava de ti gotinên neyênî an rexneyî nayê kirin.

Dema gotinê tê ser kurdan, fikra derbarê dewletê de diguhere ji nişka ve. Di nav behsa neteweperweriya tirkan de, qala İsmail Beşikci tê kirin û rexnekirin ku “ji bo kurdan dewlet” dixwaze. Helwesta Beşikci wek listikek împeryalist ku dixwaze gelan bi hev bide qirkirin, kişkişkirina neteweperweriyê û aletbûna bo listikên hêzên mezinê tê pê nasekirin; Beşikci sûcdar dike ku “qasî van nebîne ji rastiyan dûr ketiye an niyetxirab e. Bi vê helwesta xwe dînamîtê dixê bin yekitiya gelan.” (r. 208)

Ev argumanên dij-neteweperwer ku li jor hatin qalkirin, dînamîtê dixin nav hişmendiya neteweyî ya kurdan û tišta ku ji siyaseta tunekirinê ya dewleta Tirkiyeyê xilas bûbe, wê jî ji hev belav dikin. Neteweperweriya kurdî dixwaze dînamîtê dixê bin hegemonyaya ku dewletên serwer li ser me ava

kirine. Lawazbûn û bêtesîrbûna argumentên dij-neteweperwer girêdayî xurtbûna argumanên neteweperwer e. Piştî ku ev argumanên dijber hatin redkirin, wê ne zehmet be bi riya gotar, xebat, kiryar û çalakiyên bi riwan-geyeke neteweperwer wan bidin jibîrkirin an bêxwedî bihêle. Di îngilîzî de peyvek heye ku ji bo me gelek tişt îfade dike: *delearning*, bi zanebûn jibîrkirina tiştên hînbûyî. Ji bo piraniya me kurdan, tiştên em li dibistanên fermî yên dewletên serwer û bi riya ji sazîyên wê yên din hîn bûne, roleke grîng dilîzin di şikilgirtina fikir, raman, tevger, têgihîştin, û nêrîna me ya li xwe û cihanê. Fikra neteweperweriya kurdî ew e ku tiştên em ji wan sazîyên fermî hîn bûne bide jibîrkirin an bêbandor bihêle. Ev helwest lazim e li hemberî gelek fikir, nêrîn û awayên têgihîştin û şîrovekirinê ku em ji siyaseta “xwe” û piraniya siyasethedarên “xwe” hîn bûne jî bê nişandan.

# zarema 14

Sal: 7 Hejmar: 14 Gulan, Hezîran, Tîrmeh, Tebax, 2021

## REXNE Û TEORÎ

**Aimé Césaire:** Name bo Maurice Thorez

...

**Haymatlos Suad:** “Kurmancên Reş” û Çavşîntirîn Kurd di Pêvajoya Self-Koloniyalîzasyonê de

...

**Fexriya Adsay:** Çêkirina Sinorekî Parçekirî û Du Nêrinên Cuda li ser Dewletbûn û Sinoran

...

**Christopher Houston:** Anti-Dîroka Ne-Geleki: Kurd, Kolonyalîzîm û Neteweperwerî di Dîroka Antropolojîyê de

...

**Hannah Arendt:** “Çi dimîne? Zimanê zîkmakî dimîne” - I (hevpeyvîn)

...

**Veysel Başçı:** Kurdên Kurmanc ên Rûdbarê

...

**Murat Başaran:** Sêwregî De Eşîrê Dimilîyan (Kîrmancan) û Dimilkiya (Kîrmancîya) Inan Ser O Cigêrayîşêk

...

**Serdar Şengül:** Peywenda Mêtîngîrîyê di Hilberin û Rexneya Edebi de: Ngûgî wa Thiong'o û Azadkirina Hiş ji Mêtîngîrîyê

...

**Adem Warnas:** Desthilata Ziman: Glottofobi, Linguîcîde û Rewşa Kurdî

...

**Remezan Alan:** Fantazmaya Romana Kurdî

...

**Sûrên İbrahim:** Goran û Geranewê bo Reşî Kurdî: Geranewê bo Kurdistan

...

**Hashem Ahmadzadeh:** Ji Çiya bo Giravê, Ji Tomis bo Manusê

...

**Ismail Güven:** Dramê Kênekê Dêrsimîjan û “Bohça”yê Abasiyanîkî

